Wezareta Perwerdehiyê ya NSW

NSW GOVERNMENT

What do I need to know if my child is suspended?

Parent/carer information

# Divê ez çi bizanim bê ka zarokê min ji kar hatiye dûrxistin an na?

## Zaniyarî ji bo ê û bav/çavdêr

### Seknandin çi ye?

Sekinandin ew e ku dema dibistan ji xwendekarekî bixwaze ku demeke dirêj neçe dibistanê. Xwendekarên li kîndergartinê heta  sala 2 dibe ku heta 5 rojên dibistanê bên seknandin û xwendekarên di sala 3 – sala 12 de dibe heta 10 rojên dibistanê bên sekinandin.

Gava ku reftarê xwendekar yên bi xem rîskekê nepejrandî li ser kesên din an jî li ser xwendin û hînkirinê dike, dibe ku midûr wî/ê xwendekarî/ê bisekinîne.

Dibe ku midûr xwendekaran biseknîn dema dema ku berê hewl dan ku reftar/ên bi xem yên xwendekaran bi awayên din birêve bibin û dibistan ji bo plankirina piştevaniyê ji bo reftar û plankirina ku çawa her kes ewle be bê ku xwendekar li dibistanê. Dema midûr biryara seknanadinê da divê tevger û pêdiviyên xwendekaran li ber çavan bigirin. Heger tevger cidî be an jî pirsgirêkek ewlehîyê be, dibe ku zarokê we tavilê were sekinandin.

### Heger zarokê min bê seknandin dê çi bibe?

Divê midûr bi devkî ji xwendekar re bibêje dema guncaw e. Divê li ku dibe bila bibe an jî di nava 24 saetan de bi awayekî devkî bi dê û bav an jî çavdêran agahdar bikin. Divê şensê we û zarokê we bê dayîn ku hûn bi dibistanê re hevdîtinê bikin da ku bersivê bidin sekinandinê. Dibistan dê bi we re li ser stratejî û piştgirîyên ku ji bo alîkarîya zarokê we werin danîn bixebite.

Midûr dê agahdariyeke nivîskî derbarê seknandinê de bide we, ku tê de sedemên seknandina zarokê we, hûrgulî û dema seknandinê.

Di dema seknandinê de wê destûr ji zarokê we re neyê dayîn ku li dibistanê be. Dibistan ji bo ku di dema seknandinê de hîn bibe dê alîkarîyê bide zarokê we û dê serî li we û zarokê we bide. Di dema seknandinê de agahîyên derbarê çawaniya piştgirîya başbûna zarokê we hene.

### Dirêjkirina sekinandinê

Heger sekinandin wextê têra plankirina peyda neke an jî rîska ewlehîyê ya ku hê nayê birêvebirin hebe, midûr dikare sekinandinê dirêj bike. Dê/bav/çavdêr, berîya bidawîbûna sekinandinê dê bihên agahdarkirin, heger dê were dirêjkirin.

### Ez dikarim îtiraza sekinandinê bikim?

Belê, heger hûn bawer dikin ku midûr biryareke neheq daye an jî siyaset û pêvajiyê rast neşopandiye. Li çavkanîya îtirazê bigerin.

Agahîyên zêdetir ên derbarê parêzvanîya ji bo zarokê xwe de hene, herweha Peymana Civata Dibistanê ya ku rêyên pêwendîya bi dibistanan re dîyar dike hene.

### Civîna çareserîyê ya seknandinê çi ye?

Zarokê we dê vegere dibistanê di an berî roja ku Zarokê we dê vegere dibistanê di roja sekinandin biqede yan jî beriya wê. Tevlîbûna we ya pozîtîf a bi dibistanê re, ji bo birêvebirina reftara zarokê xwe û pêşvebirina çareseriyên bi hev re, gelekî girîng e. Berîya ku zarokê we vegere dibistanê, dibistan dê bi rêya telîfonê bi we re têkilîyê deyne da ku bi xebatkarên dibistanê yên ku bi zarokê we re ji nêz ve dixebitin civîna çareserîyê saz bike.

Hevdîtin dikare bi awayekî şexsî, li ser telîfon an jî onlayin bi formeta ku şensê herî baş ê nîqaşeke erênî bide. Civîn wê li ser hunê çawa bi hev re bixebitin û piştgiriyê bidin zarokê xwe dema ew vegerin dibistanê. Hun dikarin kesekî piştgirîyê bide we bi xwe re bînin civînê. Kesekî piştgirîyê, dibe ku kesekî dikare alîkarîya pratîk û/an jî hestyarî bide we û/an jî bide zarokê we.

Ji bo reftarên bi xem ku pêdiviya wan bi stratejî û piştgirîyên zêdetir heye, dibistan dê bi we û zarokê we re kar bike da ku planekê bo piştgirîkirina wan û kêmkirina her metirsîyekê bi pêş ve bibe. Jixwe dibe ku ya  zarokê we hebe. Heger planek jixwe di cih de be, ji bo ku alîkarîya zarokê we bikin dê bihê eyarkirin. Ev plan wê bi we û xebatkarên din ên li dibistanê yên piştgiriyê didin zarokê we ve bê parvekirin.

### Ya ku reftar dîsa bibe?

Eger reftarên bi xem dîsa dubare bibin, tîmê piştgirî ya fêrbûna dibistanê dê hewl bide ku rêbazên ku ji bo fêrbûna zarokê we piştgirî bikin, dibe ku ji bo sekinandina din be, ev yek dibe ku pisporên ji nav beşê ji bo piştgiriyê alîkariyê peyda bikin.

### Ez dikarim çi agahîyê ji dibistanê bigirim?

Hun dikarin agahîyên zêdetir ji dibistanê bixwazin bê ka çi bûye û çima. Divê dibistan sedema biryarên xwe ji we re şîrove bike, dê çi çalakî yan jî bikin û çi bikin eger pirsgirêkek hebe.

### Xizmeta wergerandina telefonî

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çi zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.